

Nav û navnîşana kesê şamilî tomar kirinê an navenda tomar kirinê (muhr):

Nivsîngeha Tomara Kansera Kilînikî ya Berlîn û Brandenbûrg Agahîyên taybet bi nexweşan

Nexweşê birêz,

Şahidî nişan diden ku hûn tûşî tumor (kanser) a giran, qonaxên destpêkî yê tumorên dilnexwaz, an tumorên qencyapergala demarî yê navendî, bûne an pêştir tûşîbûna we ji vê nexweşîyê re hatîye zelal kirin. Bijîşk û navendên bijîşkî berpirsin ku agahîyên taybet bi we û tumora we ji Nivsîngeha Tomara Kansera Kilînikî ya Berlîn û Brandenbûrg re e veguhezînin. Nivsîngeha Tomara Kansera Kilînikîji **bogêşkirina kalîteya parastinên tumornasî** pêk hatîye. Ev nivsîngehe ser esasa girêbesta li navbera eyaletên Brandenbûrg û Berlîn da hatîye damezirandin.

Di berdewamîyê de liser Nivsîngeha Tomara Kansera Kilînikî, berpirsîyên vê û şewaza pêvajoya agahîyên şexsî yê we livê hinek şirove têne pêşkêş kirin. Eger pirsek we ya din hebe, gel bijîşkê tedawîkerê xwe an Nivsîngeha Tomara Kansera Kilînikîya Eyaletên Berlîn û Brandenbûrg ê pêwendîyê bigirin (Agahîyên pêwendîyê di berdewamîyê de hatine).

Em ji we daxwaz dikin ku di rûpela dawîya vê nameyê da bi nivîskî ragehînin ku agahîyên jêr we standine û lê têgehîştine.

Têgeh û armanc ji bo nexweşan

Agahîyên giştî ser kanser, şewazên derman kirinê û pêşkevtinên nexweşîyê ji hejmarek zêde ji nexweşan tê standin û bo lêkolîn kirin û geşkirina berdewama pêvajoya heyî ya dermanê kanserê tê bikar anîn. Hûn wekî nexweş dikarin rasterast ji agahîyên komkirî, mifa bistînin:

- Bijîşkên tedawîkerên we dikarin agahîyên we yê şexsî ku di Nivsîngeha Tomara Kansera Kilînikî da tomar bûne, daxwaz biken, xênjî ku we izin nedabe ku agahîyên we yê şexsî di Nivsîngeha Tomara Kansera Kilînikî da bêne tomar kirin. Li dema guhertina bijîşk, derketina li nexweşxanê yan tûşîbûna dubare ji nexweşîyê, ev agahîyane bi mifa dibin. Pê hebûna ev agahîyane, dikarin şewaza herî baş bo derman kirina we hilbijêrin.
- Herwisa bijîşkê tedawîker dikare ev agahîyane ji bo rabêja gel hevkarên xwe liser taqî û bi-ryarên herî baş bo peyda kirina şeweya derman kirina herî baş, bo nimûne di civînên girêdayî bi tumorê, bikar bîne.
- Tedawîgeh û nexweşxane jî dikarin kurtasîya lêkolînên taybet bi kêrhatîbûna şewazên cûdabo derman kirina tumorê ku ji bo nexweşan têne bikaranîn, bikar bînin.

Mifayên nivsîngeha tomar kirina kansera ser esasa nifûsê (epîdemîolojî)

Nivsîngeha tomar kirina kansera kilînikî daneyên taybet bi epîdemîologiya we (regez, meh û sala ji dayik bûnê, navnîşana we, pêhesina tumorê û cûreya tumorê) û agahîyên nasnameyî, bilî agahîyên bîmeyê, ji **Nivsîngeha tomar kirina kansera berbilav re (www.berlin.de/gcc) vediguhezînin.**

Nivsîngeha tomar kirina kansera ser esasa nifûsê (epîdemîolojî) navendek ji bo kom kirin, ragirtin, pêvajoya kirin, lêkolîn kirin û şirove kirina daneyên taybet bi tûşîbûn û pêşketina kanserê di herêma di bin dapûşa diyar kirî da ye. Nivsîngeha tomar kirina kanserê bingeheke kêrhatî ye ji bo bidestxistina agahîyên bêtir liser hecetên tûşî bûn û pêşketina kanserê dabîn dike. Herwisa ev navende daneyên bênav jib o lêkolînên zanistî dabîn dike.

Mifayên Lêkolînê

Nivsîngeha tomar kirina kansera kilînkî, ser esasa daxwaza we û bê rezamendîya we, tenê daneyên şexî yê bênav an şifre bûyî (bi navê nerastî) ji bo armancên pêvajoya girêdayî bi pîlanên rastî yê beşa Lêkolînên Lênêrînên Nexweş dê bişîne. Eger pêkanîna pîlana lêkolînê tenê bi hebûna agahiyên nasnameyîyê we gengaz be (bo nimûne bi heceta pêdivîyê bûna rapirsîyê ji nexweş), divê destpêkê rezamendîya nivîskî ji we bê standin

Agahiyên ku ji nivsîngeha tomar kirina kansera kilînkî re dêne şandin:

Agahiyên şexsî yê nasnameya we, bi taybet:	Herwisa, agahiyên bijîşkî yê balkeş liser kansera we, bi taybet:
<ul style="list-style-type: none"> Paşnav, nav, navê berê Navnîşana rûniştina we ya sereke Rojbûn Regez Agahiyên liser bîme ya we, û eger pêwîstbe, jêderên alîkarîya aborî ya we 	<ul style="list-style-type: none"> Tîp û cihê tumorê Daneyem zelal kirinê Piştirast kirina tîpa zelal kirinê Tîp, dema destpêkê, mawe û encama dermanî, di nav de bandorên kêlekî Pêşketina nexweşiyê.

Parastina agahîyan

Nivsîngeha Tomara Kanserêji zagonên dijwarê parastina agahîyan, rêzê digire. Berfirehî, ragirtin, bikaranîn, veguhestin û betal kirina baneyan ser esasa pêdivîyên zagonî pêk tê û berpirsên parastina agahîyan di eyaletên Brandenbûrg û Berlîn da, ser çavdêriyê dikin.

Hemû agahiyên şexsî yê pêwîst di cihê kêrhatî û cûda ji Nivsîngeha Tomara Kansera Kilînkî da têne ragirtin û pêvajoyê kirin. Tenê hinek ji kesên izindar dikarin agahiyên we bidest bînin û ev kesane li bin pêdivîyên dijwar yê parastina herêmên şexsî ne. Qonaxên din yê pêvajoyê kirina amarî bê agahiyên nasandina nasnameya şexsî, pêk tê.

Daneyan tenê dikarin pê pêkanîna mercên taybet û misogerker ji Nivsîngeha Tomara Kanserê di welatên din, Nivsîngeha Tomara Kansera Giştî¹ ya epîdemîolojî, an rêxistinên din ê zanistî re têne şandin.

Mafê izin nedarî

Liser şandina raporên ji nivsîngeha tomar kirina kansera epîdemîolojî

Hûn dikarin izinê nedin ku daneyên we yê bijîşkî, çî raporê an giş rapor, di Nivsîngeha Tomara Kansera Kilînkî da tomar bibin. Di rewşa wisa da, daneyên nasnameyî (ji Nivsîngeha Tomara Kansera Kilînkî re têne şandin lê agahiyên taybet bi tumorê an daneyên bîmeya we nayêne şandin. Nivsîngeha Tomara Kansera Kilînkî tenê bi wî awayî dikare bizane ku nabe dubare bo daxwaza agahiyên bijîşkî yê bermayî gel we pêwendîyê bigire, ji ber ku we pêştir destnîşan kirîye ku hûn izinê nadin.

Eger hûn paşê gel ragirtina raporên di Nivsîngeha Tomara Kansera Kilînkî da dijber bin, daneyên bijîşkî ku li vir têne ragirtin tê bêne têk birin û agahiyên we yê nasnameyî ji komek din a daneyan re tê bê şandin daku li nava geryana giştî ya daneyên Nivsîngeha Tomara Kansera Kilînkî da cih negire.

Dikarin nerazî bûna xwe ji bijîşkê tedawîker an beşa xizmeta Nivsîngeha Tomara Kansera Kilînkî re rabigehînin. Agahiyên pêwendîya gel navendên tomarê dikarin di beşên jêr an di malpera www.kkrbb.de da peyda bikin.

¹Nivsîngeha Tomara Kansera Giştîya Eyaletên Berlîn, Brandenbûrg, MeKlenbûrg- Pomeranya Rojavayî, Saksonî-Anhalt û Eyaleta serbesta Saksony û Thuringîn.

Eger ji armancên pêvajoya tomara kanserê piştgirî bikin û tedbîrên navbirî qebûl bikin, pêdivî bi pêkanîna çî karek taybet tune ye. Eger li gel ragirtina daneyên bijîşkî di navenda Nivîngeha Tomara Kansera Kilînikî da dijber bin, lêkolîn ji were çê nabe..

Liser şandina raporê ji nivîngeha tomar kirina kansera kilînikî

Nexweşên ku jîngeha wan ya sereke eyaleta Brandenburg ye, xênjî mafê izin nedana ragirtina daneyên bijîşkî, mafê wan heye ku dijî şandina daneyên epîdemîolojî ji aliyê Nivîngeha Tomara Kansera Kilînikî bo Nivîngeha Tomara Kansera Giştî ya epîdemîolojî, bisekinin.

Nexweşên ku jîngeha wan ya sereke eyaleta Berlîn emafê wan tune ye ku dijî şandina daneyên epîdemîolojî ji aliyê Nivîngeha Tomara Kansera Kilînikî bo Nivîngeha Tomara Kansera Giştî ya epîdemîolojî, bisekinin. Kesê meşmûl an navenda ragehandina raporê divê ev daneyane li gel agahiyên nasnameya xwe radestî Nivîngeha Tomara Kansera Kilînikî bike.

Mafê agadar bûnê

Mafê we heye ku agahiyên taybet bi lixwe ku li Nivîngeha Tomara Kansera Kilînikî hatine ragirtin, bidest bînin. Ji bo bidest xistina ev agahiyane, divê daxwaza nivîskî ji bo nimûne daxwaznameya nivîskî ya berhev bûyî ji aliyê karmenê Nivîngeha tomar kirina kansera kilînikî ku we ev îmze kirîye, radestî Nivîngeha tomar kirina kansera kilînikî bikin (Navnîşanên jêr temaşe bikin) di nava vê daxwazê divê Paşnav, nav, navê berê, regez, rojbûn, navnîşana rûniştina we ya sereke, hebin an rûnivîsa wê radestî Nivîngeha Tomara Kansera Kilînikî bikin. Paşê tê ji we bê daxwaz kirin ku bijîşk an diran bijîşkek biden naskirin daku Nivîngeha Tomara Kansera Kilînikî, agahiyên nivîskî yê taybet bi daneyên we, danê berdestê wî/wê. Ev bijîşk an diran bijîşkek ev daneyan bi rewşa pisporî ji were şirove dikin. Eger bijîşk an diran bijîşkek ji Nivîngeha Tomara Kansera Kilînikî nedin naskirin, agahiyên nivîskî rasterast piştî piştrast bûna nasnameya we, ji Nivîngeha Tomara Kansera Kilînikî re tê radest kirin.

AGAHÎYÊN TAYBET BI TESVÎYEYA BÎMEY ŞEXSÎÛ YAN KESÊN XWEDÎMERCÊN QAZANCAN!

Nivîngeha Tomara Kansera Kilînikî xercên hatî sepandin (destheqa nivîngehê û destheqa tomarê) ji aliyê nexweşên xwedîyê bîmeya şexsî an kesên xwedî mercên qazancan- berevajî pêvajoya asayî- rasterast ji kompanîya ya bîme yê an nivîngeha qazancên têkildar tê daxwaz kirin. Ji ber vê bijîşkê tedawîkerê we agahiyên pêwîst (wekî nivîngeha qazancên têkildar) ji we hêvî dikir. Ji bo tesvîyeta rasterast gel kompanîya bîmeya şexsîû/an nivîngeha qazancan, veguheştina dualî ya daneyên şexsî yê we gengaze ji bo derçûna hesabê, pêwîst be, helbet eger we rê dabe ku daneyên bijîşkî yê şexsî di Nivîngeha Tomara Kansera Kilînikî de bêne ragirtin.

Naverrok û agahiyên bêtir

„Klinisches Krebsregister Brandenburg und Berlin gGmbH“:

Dreifertstrasse 12

03044 Cottbus

Germany

Telefon.: +49 (0) 355 49493 100

Feks: +49 (0) 355 78010-489

Email: kkrrbb@laekb.de

www.kkrbb.de

Navendên Tomarkirina Nivsingeha Tomar kirina Kansera Kilînikî

<p><u>Navenda Berlîn:</u></p> <p>Registerstelle Berlîn Potsdamer Str. 182 10783 Berlîn</p> <p>Telefon: +49 (0)30 21993 223 Feks: +49 (0)30 21993 208</p> <p>Email: uta.stoetzer@kkrbb.de</p>	<p><u>Navenda Kotbûs:</u></p> <p>Registerstelle Cottbus Thiemstrasse 111 03048 Cottbus</p> <p>Telefon: +49 (0)355 49493 130 Feks: +49 (0)355 49493 139</p> <p>Email: sekr_cb@kkrbb.de</p>
<p><u>Navenda Frankfurt:</u></p> <p>Registerstelle Frankfurt (Oder) Müllroser Chaussee 7 15236 Frankfurt (Oder)</p> <p>Telefon: +49 (0)355 49493 300 Feks: +49 (0)355 49493 309</p> <p>Email: birgit.kindt@kkrbb.de</p>	<p><u>Navenda Neurupîn:</u></p> <p>Registerstelle Neuruppin Fehrbelliner Strasse 38 16816 Neuruppin</p> <p>Telefon: +49 (0)355 49493 400 Feks: +49 (0)355 49493 409</p> <p>Email: sekr_np@kkrbb.de</p>
<p><u>Navenda Potsdam:</u></p> <p>Registerstelle Potsdam Charlottenstrasse 72 14467 Potsdam</p> <p>Telefon: +49 (0)355 49493 450 Feks: +49 (0)355 49493 459</p> <p>Email: doris.niepmann@kkrbb.de</p>	<p><u>Navenda Şwedt:</u></p> <p>Registerstelle Schwedt Auguststrasse 23 16303 Schwedt</p> <p>Telefon: +49 (0)355 49493 460 Feks: +49 (0)355 49493 469</p> <p>Email: birgit.kindt@kkrbb.de</p>

Piştirast kirina agahîyên belav bûyî
bijîşkê ragehîner an
Diranbijîşkê ragehîner (forma raporker)

Paşnav, nav

Ast

Piştirastkirin-nexweş

Ez

Paşnav, Nav

Rojbûn

Piştirast dikim ku rizamendîya min heye ser veguhestina agahîyên şexsî yê xwe (bi taybet daneyên bijîşkî) ji alîyê bijîşk an diranbijîşkê navbirî ji Nivîsîngeha Tomara Kansera Kilînikî di eyaletên Berlîn û Brandenbûrg re û ez radigehînim ku maf min di vê babetê da bi devkî û nivîskî ji min re hatîye ragehandin. Ez ji ev agahîyane têgehîştîme û rûnivîsek ji vê bergê min standîye.

Roj

Cih

*Îmzeya nexweş
An nûnerê zagonî*

Piştirast kirina agahîyên belav bûyî –Kesê raporker

(Tenê di rewşekê da pêdivîye ku piştirastkera nivîskî ya gehîştina agahîyan ji nexweş re tune be)

Rizamendîya min heye ser veguhestina agahîyên şexsî yê xweji Nivîsîngeha Tomara Kansera Kilînikî di eyaletên Berlîn û Brandenbûrg re û ez radigehînim ku maf min di vê babetê da bi devkî û nivîskî ji min re hatîye ragehandin. Ez ji ev agahîyane têgehîştîme û rûnivîsek ji vê bergê min standîye.

Roj

Cih

Îmzeya kesê pêşkêşkerê agahîyan